

Biryarnameya Giştî ya Navçeya Oldenburg

Ji bo Ragirtinê Nexweşiya Nefesê ya “Covid-19” ji hêla hokara nexweşiyê Koronayê SARS-CoV-2 Li Navçeya Oldenburgê ji 03ê Hezîrana 2021-an ve

- Guhartoya Kurt bi Zimanê hêsan -

JI 05.06.2021-AN VE QANÛNIYE

Qedexyên Têkiliye

Li hindirê qada taybet (Apartman/Xanî/Milkê) û ji bo derveyî di nav miletê an civatê de derbasbare:

Civînan bi 10 kesan re herî zêde ji sê malbatan re gengaz e.

AN

Her kes dikare li wir bi tenê an bi mirovên ku ji malbata wan re ne re bimîne. Li vir herî zêde du kesên din ji malbatên din de dikarin tevî vê bibin.

Zarokên têkildar ên heya 14 salî jî tê de destûr tê dayîn ku dikarin beşdar bibin.

Zarokên heya 14 salî jî dikarin herî zêde bi 10 zarokan û mezinên ji yek malbatê re werin rexa hev û hevdiştin bikin.

Navendên lênihêrîna rojane ya zarokan/Zarokxaneyên rojane û dibistanan

Çalkiyên birêkûpêk li baxçeyên zarokan û li hemî dibistanan, di nav de Graf-Anton-Günther-Schule (GAG) li Oldenburg jî, pêk tên.

Ajotin

Kesên ku wekî rêwî beşdarî civaka ajotinê ya profesyonel dibin divê di trêmpêlên ku tene bikar anîn, rûdankên pijîşkî li xwe bikin. Pêdivîbûna rûdankê di nav trêmpêlên taybetî yê bikar hatî de tu hewce tune, heke mirovên derveyî malbatê rêwîtiyê dikin.

Hewcedariya Rûdankê

Pêdiviya rûdankê, mînakî li bazara heftane û parkgehên supermarketan, di cîh de dimîne û didomîne.

Karantîne

Heke ceribandinek bilez a antigên erênî be, divê kesê têkildar li malbatê biçe tecrîdê di nav malê de û tavilê testa PCR bike. Heke testa PCR negatîf bibe, tecrîd bixweber bi dawî dibe. Divê beşa tenduristiyê bi e-nameyê bi corona@oldenburg-kreis.de an bi tîlefônê bi 04431/85-100 re were agahdar kirin.

Dikanên kel û pelan firotinê:

Dikanên kel û pelan firotanê bêyî hewceyê ceribandinê vekirî ye, lê bi hewceyê rûdankek vekirî ye.

Gastronomî:

Gastronomî bêyî mecbûriyeta testê dikare hem li hundir û hem jî li derve vebe.

Bar/dîsko dikarin bi kapasîteya ji sedî 50 vebin û ceribandin/testê jî hewce ye.

Betlanê û werziş:

Tesîsên werzişê û hewzên avjeniyê vekirî ne.

Binpêkirinek ji van rêzîknameyên Biryarnameya Korona ya Niedersachsen li gorî paragirafa 19 ya Nds ya Biryarnameya Koronayê û Benda 73-an Beşa 1a Hejmara 24 a IfSG tawanbarek îdarî pêk tîne ku dikare bi cezayê pere yê heya 25,000.00 EUR were cezakirin.